

ROJA NÛ

KWEDI Û GERINENDE : MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libanê; 10 liroyên Sûrf; ji bona welatên din 2 liroyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

CENG & SIYASET DEWRAN

KURDISTAN
EXBAR-EL-HERB, 26 KANONA
PAŞIN 1944. HEJMAR 53.

Xelk Ji Welatê

Kurdistanê e çiyayîn û spehî tiştine hindik dizanin, ji ber ko sîdda vî welatî di nêşiyatê de kêm e, di heq û wêşê wî de kêm tişt hatine nivîsandin û belav kirin.

Herçî teqîlata siyasî sîdda Kurdistanê di vî warî de jî ne qenc e. Kurdên ko mîdarê wan di nav bira heşt û neh milyonan de ye, welatê wan ên çiyayî û sêgoşê di nav beyna Tirkîyê, Iran û Iraqê de hatiye tek ve kirin, weşandin kirin.

Bîrek ji Kurdan di Sûriya bakurî de ne. Elîne hîkmetî di serîne din de rûniştine. Kurdên Iraqê qedere milyonekî ne. Kurd jî nijadê arî ne. Weşîtan wan ên xwester hene. Bi zîmanekî xwesterê xwesterin.

Ev zîman dimîne Tirkîyê, 10 na keve atzîngî erebîyê.

Kurd Bi Mîrariyê

Têne wesîfandin. Bi xwe jî pî îftixar dikin ko di nav mîletên dinyayê de ew ê qewîtir in.

Rûyê erdê Kurdistanê Iraqê bi qasî Skotlandê ye.

Tê de bergehine welê hene ko çav kêm caran ji wan spehîtir dibînin. Wî welatî çiyayîne asê û rût hene ko bilindahiya wan digehit heta 12.000 peyî. Ji serê wan çiyân lehî a robarin dadikevin nevalîne bijûn, yên ko jî rêl û daristanan tejlî ne.

Kurd di wan newalên bijûn û di lêf û pesarên çiyân ên nîzîm de birinc, çeh genim a her texlîl fêkiyan diçînin; wek pirtîqal, xox, hêjîr, zeytûn, sêv û alûcan.

Hin gund û bajarên Kurdistanê bi spehîtiya bergehên xwe dikovin ber çavan. Rewandîz li ser pehnava çiyakî hatiye ava kirin.

Amediya ko bi qub û mîsarayên xwe nas e, li ser girêkî bi çend hezar mêtiran bîlîad hatiye danîn û ev bajar dikovit ramerî nevaleke dirêj, ya ko diçe heta çiyayên Iranê. Ev bajar bi çelangiya xwe dimîne şaristanên wêşanewî yên ko kitêben qedim wesfên wan dane.

Heçî Akîre, Penowîna Skoy-sineq bajarîne pişak in, de abi spehîtiya xwe dîrîba ne. Di Kurdistanê Iraqê de Sîlemaniyê bajarê meztir e.

Kurd Mîletkî Çiyayîn

û qewîn e, bikeve ber kîjan xelkê û dişwariyê jî, ji heq derdê, û jiber vî yekê, li ber dilê xelkê şîrin in.

Kurd hetaal îro çîlên xwe a nîjadî di xwe dikin, destmalêkî meza li kumê xwe wer îlin; se-

DI ORTA PESIFIKÊ DE

MELBURN— Qiwetên emerkani en mezin yên ko hefta borî di Orta Pêşîfkê de dirêjî khergiravên Marşalê kiri bûn, li gora nûçeyên dawîn bi serfirazî şerê japona, dikin û jî nû ve pê li erdê du giravan kirine.

LONDRE— Piştî ketina Ordiya Sor axa Polonyayê, welatperwerên Polonî hêj betir berberiya elemana dikin û wan welatparêzên he midirê Warsawayê e polîsê—yê ko eleman bû—û pênc karkerê din kuştine. Li ser wî elemana sed poloniyên hêja dane ber tîfinga

DANEZANA HEVALBENDAN

Qerargeha Hevalbenda a Mezin li eniya Behra Spî dide zanîn: Di eniya Ordiya pêncan a bîngehîn de, li hêla Kasinoyê şer bi awakî xurt dom dike; di bakur û roavayê vî şaristanê de yekneyên me jî nû ve pêş ve çûne. Di qada Anziyoyê de yekneyên britanî, emerkani yên Ordiya Pêncan gelek ber-êrîşên elemana paş ve birine û hêsrî girtine. Leşkerên Ordiya heştan pêş ve ketine û bajarên Pîzo—Fêrato û Montene Rodomo standine.

Bombeavêjên me ên navhincî li rê û rêhesinên Ortayê û li gehneka rêhesinan ya Fraskatiyê dane ber derbên xwe. Bombeavêjên Hevalbendan ên sivik li rê û rêhesinên bakur û nîroyê Romayê xistine.

Nêçîrvanên me di ser qada gerê Anziyoyê re firiyane, karê xwe ê dîdevanî û nobetdariyê pêk anîne û zor dane dijminan.

Bombeavêjên Hevalbendan ên navhincî di Behra Edriyatîkê de bi ser waporên dijminan de girtine û lîxistine. Di vî navê de deh balafirên dijminan hatine avêtin erdê. 13 mekîneyên me venegestiyane warên xwe.

MOSKÛ— Bi awakî resmî didin zanîn ko yekneyên Ordiya Sor ketine taxeyên Nîkopolê.

MOSKÛ—Şevadî refên sovyetî, jî bombeavêjên giran bîhevkefî dirêjî payetextê Fênlandiyayê Helsînkî kirine û li hêjagehên eskerî xistine, 5 mekîne venegiyane warên xwe.

ENIYA BEHRA SPI

LONDRE— Di nîroyê Romayê de qiwetên Hevalbendan bi xurtî şerê dijminan dikin. Bîrek jî bajarê Kasinoyê hêj di destê elemana de ye; topçiyên hevalbendan rîya vî bajarî bi xurtî bombardîman dike.

Di pêşiya serpira Anziyoyê de elemana bi yekneyîne S.S. pişta qiwetên xwe xurt kirine.

Êrtîşên elemana hatine paş ve zivirandin û xesarîne dijwar gihane wan; her çend jî elemana bi tangên giran emel dikirin. Di vî qadê de hewa çêtir bûye û gaziya hevalbendan hatiye; wextekî nîzing de hevalbend di vî eniyê de, dest bi êrtîşine mezin bikin.

STOKHOLM— 200 bombeavêjên sovyetî dirêjî payetextê Fînlândiyayê Helsînkî kirine; bi derbên bomban cih bi cih agir bi vî bajarî ketiye. 38 peya hatin kuştin û 232 heb jî brîndar bûne.

Kovareke Kurdî a Nuh

DENGÎ GÎTIYÎ TAZE

Heta nîbo posta Iraqê jî me re «Jîn» û kovara kurdî a hêja «Gulavêj» dianf û em bi wan şa dikirin. Îcar vî postê çavên me bi kovareke nû bi ronî kirin. DENGÎ GÎTIYÎ TAZE. Gîttî an kîttî bi mana dinyayê ye, bi kurdmançiya me: Dengê klîtiya taze.

Kovara me a nû bi her awayî hêja û sezayî her pesn û şîkranê ye. Dengê klîtiya taze kovareke mezin û bîresim e. Her rûpelê wî bi qasî rûpelêkî Roja Nû ye û hejmara wê a sîseyan — ya ko gîhaştê destên me — jî 48 rûpelan hatiye pê.

Ev kovar sefartxana britanî ya Bexdayê bi xwe derêxistiye û ew tiştî li ser kovare hatiye nivîsandin. Ev kovar jî aliyê ingilîzan jî kurdan ve diyarîke mezin û giranbeha ye. Me jî hikûmeta qralî gelek mînetê û em-sîpasên xwe ên bêpîvan pêşkêşî wê dikin û jî kovara me a nû re jîyîneke dirêj û kamiran hêvî dikin.

Li Iraqê kurd di zîman û girêdana xwe de serbest in. Bi gotî, nên din di Iraqê de kurd Xwediyê heqîne mîllî ne û jî cînsiyeta Iraqê fêdemend dibin.

Kurdistan ko rojekê dikare bête danîn wê çawan bibe? me bi çend pîrasên kart wesîfandiye

Herçî çîkîkî Wan qedere du yerdan dirêj in, û gava wan li zêndên xwe dipêçînin ew wek çîkîkê dişuyin.

DIYARÊ STÊRÊ

Mîrê Botan, Serekê Xortan
Kamîran Alî Bedîr-Xan

Her bîjî xwediyê Stêrê, tevî jîna nejadê xwe ê ber mirad û ramana. Her kurd û nemaze xortên xwendevan minetkarê xebata we ne û azahî û serxwebûna xwe, bi havîla pispor û fedakarên wek we hêvî dikin. Belê em bi xebata we bawer in ko mîletê me berxudar dibe û ev Stêra ko derketiye, Stêra bextê me ye. Belê ew hilavêtîye her wekî Xanî gotiye: «Lalî bibî-tî jî bo me kewkeb», belê li gora her derketin û hilavêtîna, diva bû ko Stêr berî rojê bîderketana, lewre dibin tîrêjên rojê de Stêr xuya nake, jî ber ko ewrê dekarîyê (siyasetê) di ezmanê azahiyê de mij girtiye.

Lewre ko Stêra Mîşterî xwe daye rex rojê û diçîrise, jî xwe rojê bîstêr na be.

Ew kîlora bin navê Stêrê, ma ne erdê Kurdistanê ye?

Ew e zolîka înan di nav de, ne parça gewir jî ala rengî e.

Ew klîqa wê Jandarka çeleng û dilhesin û gurçîkpolî û kirdeyên xebata wê ne jûbo dîlgemî û nav tîdanek jî gelê me û bîranîyek jî neyarê Fransa re ye?

Ew Fransa ye ko, zînet û ronahiya cîhanê, bi nîftîka wan vîket û pisporê wek Monteskiyo rêzana ayê beşer pêştîve destdirê jan kir.

Îro jî, egîd û xwînrêjên wek general De Gol û hevalên xwe bi dilekî xurt û dengekî bîind gazî dikin û dibêjin.

Ho!... Frense, ên bin sî, dilgeş û haydar bin û geuç bizanin ko bayê zeferê dilê xortên welatî, ewrê sîtemkariyê daye ber xwe û ber bi Zagrîfa û Mûjîno ve dibezîne.

Belê mezin û xebakarên me jî, wê navtîdanê di me didin û dibêjin:

Lo... xortîno... ma jî me re ne pesn e ko gelê wek Frense navdar û bîngehîn îro bûye hevalek me î brîndariyêk dil bixwîn, em hêvî jî Yezdan û zîndê xortên dilawer dikin ko van her du mîletan vejînin û dîsa bînen ser kewna xwe a berê, her wekî kurdmanc dibêjin:

«Jî giya nermîrî tûne, di bin kevîr de na mîne.

«Xwellî li wî dilî be ko tîde «bîrîn û ramancî tunc be. Hefîf li wî maldarî be ko jarî a belagazî ne di be.

«Bawerî li wê hikûmetê nayê ko dilî ne di be.

«Mexabin jî wî bîjişkî re ko «bîrîn û nexweş ne di be.»

Her roj sed carî proz, jî devê xortên welatî, jî Stêra zelal re, ezbenî, Mîrê min.

Amûde : Hesun Hîgyar

BERLÎN— D.N.B. elamî dîde ko di nîzingî peravên Japonayê de, waporêke Japonî ko tî de 700 peya hebûn hatiye bin av kirin.

DEMA NIHA

LONDRE— Kral û kralîça Ingilistanê çûne ziyareta Qerargeha mezin a bombeavêjan.

MOSKÛ— Di vegirtina serpira Nikopolê de yekinevên Ordiya Sor 23 tang, 217 qumbereavêjen çeperan 320 mitralyoz 1.277 otomobîl 520 firçon cebîlxane dagirtî û zehf çek û silehên elemana ên din xirakirine. Leşkerên sovyetî jî aliyê din 24 tang, 392 top 180 qumbereavêjen çeperan, 473 mitralyoz 4.000 tîfing û otomatîkên sivik, 1.686 otomobîl 86 traktor, 171 motosikil, 20 depoxane standine û 3.000 hêsr girtine.

Strava Kurdi

SÊVOKA HEÇI

— 2 —

Mîr Mehmûdê Cindî, lawê mîrêkê Palo sibehê roba taştîya,
Çavê xwe jî xewa şîrîn vekiriyê,
Li dora xwe nêrî ko tiştek tu neye.

Bi dilki kul î şikestiyê, derket ber devê deriyê;
Nêrî ko bavê wî, li ber devê derî sekiniyê.

Bavê Mîr Mehmûdê Cindî, li madê mîr Mehmûdê Cindî nêriye;
Nêrî ko madê wî giran e go:
Lawo, ru'ê min bi qurbana ruhê te be, hewala te çi ye?

Go—ya bo, min şevêçûyî, xewnek jî xewên şevan diyê... ez ne ma zanim, ne xewna min şeytanî ye û ne xewna min î rehmanî ye.

Mîrêkê Palo go:
Lawo, mîr Mehmûdê Cindî, xewna te î şeytanî ye, ev şixlê şeytanî fanetiyê;

Gava ez xort bûm, ez li cem mala bavê xwe bûm, min gelek caran xewnên wilo diyê,

Şeytanê fanê lê hat, xwe dixê şibyetê qizê xelkê, tê li civatê xortê qenc sekiniyê.

Wê gavê Mîr Mehmûdê Cindî go pîrç û kenîya, go:

Ya bo, xewna min ne şeytanî ye, xewna min î rehmanî ye.

Ya bo ma ev navê kê ye, çi li ser nivîsî ye.

Bila Xwedê bike miradê miradxwaza; miradê lawê te jî bike bi Sêvoka Heçiyê.

Tev lo dilo, tim lo dilo
Dil bi kulo dilo...

Wê gavê Mîrêkê Palo li madê lawê xwe nêriyê, go:

— Lawo Mîr Mehmûdê Cindî hewala te çiyê?

Mîrêkê Palolî madê Mîr Mehmûdê Cindî nêriyê, nêrî ko dihin bûye, ismê aqil li serê wî tu ni ye.

Tew lo dilo, tim lo dilo
Dil bi kulo dilo, rezilo dilo..
Tirê xeybaniya lê keto dilo..
Wê gavê Mîrê Palo rabûye piyê

Hêdika bi lingê Mîr Mehmûdê Cindî girtiyê, qeyd û merbend li xistiyê; xist odekê û derî lê xelî qandiyê.

Mîrê Palo çû cem şex û mela, jê re nêriyê...

Ne ezîmak hiştî bû, û ne kî-têbek hiştî bû, çara Mîr Mehmûdê Cindî li dinyayê ne diyê.

Mîrêkê Palo êdî rabû piyê;
Xelat li heft eşîrên Palo bela kiriyê...

Dawet bi heft def û heft zîrnan li dar daniyê

Çiqeys xort û qiz li wan welat û şarîstana hemî civandiyê;

Heyanî ko dawet tekmlîl bû...

Wê gavê Mîrêkê Palo, hati bû li ber Mîr Mehmûdê Cindî sekiniyê. Mifta li qeydê xist, qeyd jî lingê Mîr Mehmûd bi der xistiyê.

Bi çepê Mîr Mehmûd girtî bû, anî bû li ber serê dilanê sekinandiyê; heya di dawîya dilanê bîderxistiyê.

Mîr Mehmûdê Cindî go:
Yabo, Xwedê hebîne hewala te çi ye?

Bavê Mîr Mehmûdê Cindî go:
Ya lawo, Mîr Mehmûdê Cindî,

ji xwe re, li vê dilanê binêr, hevqas qiz mi li vê dilanê civandiyê, tu destê xwe li ser kîjan deynî, ezê ji te re bînim bi helaliyê...

Wê gavê Mîr Mehmûdê Cindî, li devê bavê xwe dikenîya, go:

Yabo, çi qehbeta giran, te bi serê min de aniyê?

Bela Xwedê teala bike miradê miradxwazan û miradê lawê te jê mîr Mehmûd bike bi Sêvoka Heçiyê.
ne qediyaye —

YANEI SERKEWTIN

Pêş çend heftê êk le kovare pîrozketan da basi «Yanef Serkewtin» kerabû. We her çend nazanim le çi seruçawekî wergirawe, belam her bo ewey ke be tewawî agadarî rastî bin em dû sê derey xwerewem nûsî:

Em yaneye her wekû le «pêrewî Yanef» da nûsrawe le layenî Marîf Çiyawukewe damezrawe be pêş goqrazî Wezareti Daxiliye «Jîmare 689» we mezû 19-20 mayis safî 1930».

Eme çarde sale, her be yarmetî we xîretî em kurde xwegewîsteman yanef jiyawe egerew nebwaya le mezû bû mirdibû. Heta parsal heî malî xwoy kirdibwe yanef, we xe-qî le wê ko debûnewe rojî penc şeme bo jinan, we rojî heîfî bo piawan, we mesrefî em kobûneweş hemû le kîşef xwoy dawe. Cenabî Marûf Beg le medaxîsi Alîya maazûna: le Darûl

Finûn şubef Adebîyat, we le Medresa Hîqûq, eme 45 sale be îşî kurdîyewe xerfke.

Le safî 1943 hawin be qerarî «Komelî Nawçê» be xoy we Sekerter Abdûlrehman Nuriçan bo şimal seferyan kirdibû bo kokirdnewey «Teberrûat» we be himmetî em zate «6.000» dinar kokrawe.

We êsta yanef xanûkî rêk û pêkî heye, pîr le mobîliyyay baş ke, le hîç yanef tir da nîye. We dergay kraytewe bo hemû lawî tîgeyîştû, we piyawî gewre, gewre hatû çî deken.

We her rojî, heynî wûtarî be nêrx, we goranî kurdi nîştîmanî debêjriê.

Ewçê pêwîstê her çî kovarekî hetana we botan de eger detwanî boman bnêrîn be adresî xwarewe:

Bagdad Mehellelî top Alwaziya Nadî el Irtîqa «Yanef Serkewtin» Mûatemedî Am «Çiyawûk»,
SORAN

MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WENEYÊN ŞER Û AŞÎTIYÊ

Xebat - Fidakarî - Serfirazî - Serdestî



Ev eskerê Frensîz Mîna Terkeserên Dinyayê Rih Berda Ye, Lê Belê Dilê wî De Eşq û Agirê Welêt, Bûye Şerevanî



Xortên Ingilîzî Mîna Çîrîskî û Brûskan Dimeşîn û silav Li Ala Xwe Dikin. Ev Xortên heja jî bona azadî û Serbestiya Cihanê Xwîna Xwe Direjînin

LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE

Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE
DE LA GUERRE

Cette semaine a été marquée par d'importants événements politiques et militaires. Ayant pris Nikopol, l'Armée Rouge avance entre cette ville et Krivoi-Rog. Des unités d'avant-gardes soviétiques se trouvent à une dizaine de kilomètres de la ligne ferrée vers Kherson, à 80 kms. de Nikolaev. Krivoi-Rog, important bastion allemand, se trouve directement menacé. Il est possible pourtant que les colonnes du Général Malinovsky ne donnent pas immédiatement l'assaut de la ville, car l'objectif immédiat de l'Armée Rouge est constitué par Nikolaiev et Kherson, les deux portes de la Mer Noire.

On voit que l'Armée Rouge célèbre à sa façon l'anniversaire de la prise de Stalingrad. Car, en plus de l'avance des forces commandées par le Général Malinovsky, l'encercllement total de 10 divisions allemandes dans la boucle du Dniepr a été achevé par les Généraux Koniev et Vatoutine. Les troupes soviétiques ont déjà commencé la réduction de ces forces allemandes, dont le dégagement paraît impossible, le gros des soldats de Von Manstein se trouvant à 100 kms. plus à l'Ouest.

A l'autre bout du Front Oriental, c'est-à-dire dans le secteur de Léningrad, l'Armée Rouge a remporté d'autres succès. Ayant définitivement dégagé la capitale du Nord d'un siège qui durait depuis deux ans, les Généraux Govorov et Mareztkov sont actuellement en train de renfermer les deux bras de la tenaille autour du groupe d'armées allemand de von Kuehler, en retrait sur tout le front, de la région de Louga jusqu'au secteur de Novgorod.

Tandis que la bataille pour Rome est engagée au Sud de l'Italie sur le front principal de la 5ème Armée, les vaillantes troupes françaises et américaines ont enfoncé la ligne Gustave sur un front large de plusieurs kms., au Nord de Cassino. Les correspondants de guerre sont unanimes à souligner la valeur des combattants français. C'est ainsi que le commandement allemand s'empresse de renforcer chaque secteur où il constate leur présence. Car les soldats de la France sont conscients de leur mission. Ils connaissent le vieux proverbe: «Tous les chemins mènent à Rome.» Ils disent aujourd'hui que la route de Rome conduit en France.

Aujourd'hui, le Wehrmacht est en difficulté, aussi bien en Russie qu'en Italie — et que dans les Balkans. Une crise sérieuse règne en Bulgarie, où les patriotes sont très actifs. Les Allemands y ont envoyé

KURDISTAN SUISSE DU MOYEN-ORIENT

Un article de l'«AKHBAR EL HARB»

On sait peu de choses sur le beau pays montagneux du Kurdistan, car il n'a été décrit que rarement, alors que son morcellement politique a fait l'objet de nombreuses publications.

Les Kurdes, qui totalisent de huit à neuf millions d'âmes, habitent un triangle montagneux situé dans les territoires turc, iraquien et iranien. Une partie de ce peuple vit dans le Nord de la Syrie et de petites communautés kurdes sont dispersées à l'intérieur de ce pays. En Irak, leur total est d'environ un million.

Les Kurdes sont de race aryenne, ils présentent des traits caractéristiques et parlent une langue qui ressemble au persan, mais diffère complètement de l'arabe. On sait qu'ils sont robustes; ils sont considérés comme le peuple le plus vigoureux de la terre et en sont justement fiers.

La superficie du Kurdistan iraquien égale celle de l'Ecosse. Là se trouvent les plus beaux paysages que l'œil humain puisse contempler. Des montagnes sauvages s'élèvent parfois à 4.000 mètres d'altitude, à leurs flancs coulent des ruisseaux et des torrents qui s'élancent vers les fertiles vallées, couvertes d'arbres fruitiers et de forêts.

Dans ces vallées et sur les premiers contreforts de leurs montagnes, les Kurdes cultivent le riz, l'orge, le blé et différents fruits, tels que les oranges, les pêches, les figues, les olives, les pommes et les abricots.

Certaines villes et certains villages kurdes sont d'une beauté exceptionnelle.

Rawandous a été construite sur le flanc d'une montagne; Amadia, célèbre pour ses coupoles et ses minarets, s'élève sur un pic immense. De là, on domine une vaste vallée de toute beauté, qui

s'étend jusqu'aux lointaines montagnes de l'Irak.

Par la beauté irréaliste de son site, Amadia fait songer aux villes féériques des contes antiques.

Penjwin et Koysandjak sont de petites cités de montagne dont le charme particulier émeut le cœur du voyageur. La plus grande ville kurde de l'Irak est Souleimanieh.

Le trait qui frappe et qui attire chez les Kurdes, c'est leur caractère de montagnards patients et actifs qui leur permet de vaincre les difficultés et le dur travail qu'ils ont à affronter.

Ils portent encore le costume national qui se compose d'un large turban, d'une veste et d'un pantalon, taillés dans une toile rude, aux couleurs vives, qu'ils fabriquent eux-mêmes. Une ceinture entoure leurs hanches, et leurs manches, dont la confection demande souvent deux mètres d'étoffe, et qui sont enroulées autour de leurs poignets, donnent parfois l'impression que leurs mains, elles aussi, sont coiffées de turbans.

En Irak, les Kurdes ont le droit de parler leur langue et de porter leur costume national. Ils peuvent développer leur culture propre et exprimer leurs sentiments nationaux, tout en bénéficiant de la nationalité iraquienne.

Notre courte description indique ce que pourra être l'avenir du Kurdistan. Ce pays pourra un jour devenir la Suisse du Moyen-Orient. En ce moment d'ailleurs, la Direction des Chemins de Fer et les Services des Travaux Publics de l'Irak, encouragés par Son Altesse Royale le Régent, sont en train de choisir les sites où s'élèveront des hôtels et des bâtiments nouveaux.

A propos du centenaire D'ANATOLE FRANCE

S'il est une intelligence qui réfile tout le travail intellectuel du XIXème siècle avec ses tendances diverses et contradictoires, c'est bien celle d'Anatole France. Comment, cette intelligence a évolué, il n'y a que ses livres qui peuvent nous l'apprendre.

Il a commencé par être un pessimiste sensible à la façon de Chénier, dans ses «Noces Corinthiennes».

Puis il se tourna vers le roman. Mais quels romans devait écrire Anatole France? Est-ce des romans d'aventures, de

mœurs, de thèse? Au fond, il en a écrit de tout genre. Cependant, une caractéristique qu'il faut bien noter, c'est qu'il part toujours d'un sujet mince, quel que soit le roman qu'il écrit: Un pauvre garçon qui aime une actrice et qui, après quelques années de vie difficile, est tué par hasard pendant la Commune, et voilà «Jean Servien», un vieux savant envoié pendant l'hiver du bois à sa voisine, une malheureuse femme en couches. La femme, devenue princesse russe, en récompense du bienfait du savant, lui offre un livre pré-

le sinistre Himmler, dont la présence n'a pu empêcher les soldats bulgares de rallier les partisans yougoslaves du Maréchal Tito.

L'Armée de Libération populaire de Tito forte de 300.000 hommes, est un véritable cauchemar pour Hitler. Après avoir combattu longtemps avec les seules armes prises à l'ennemi, Tito reçoit maintenant une aide alliée efficace. Il contrôle près de la moitié des territoires yougoslaves et prépare la prochaine invasion alliée, dont son armée est l'avant-garde.

Tito immobilise plusieurs divisions allemandes en Yougoslavie, en Italie et ailleurs. Privé de troupes de réserve en nombre suffisant, le Haut Commandement Allemand envoie des troupes bul-

gares et hongroises contre l'Armée Populaire de Libération. Mais les Bulgares désertent dans les rangs des partisans. Quant aux Hongrois, ils ne savent comment sauver leur peau. Budapest affirme sans cesse que les Hongrois ne combattent ni en Russie, ni dans les Balkans.

Le but de ces démentis est évident. Le Gouvernement Hongrois veut éviter le châtiement de sa complicité avec l'Allemagne. Mais Radio Moscou vient d'établir la présence de 12 divisions hongroises sur le sol russe. De son côté, Tito rapporte que d'autres unités hongroises combattent en Yougoslavie. Ainsi, la collaboration de la Hongrie avec le Reich est flagrante et elle devra le payer un jour.

LES DENTS SERREES

par JEAN AMY

Je hais. Ne me demandez pas ce que je hais. Il y a des mondes de mutisme entre les hommes, Et le ciel veule sur l'abîme, et le mépris Des morts. Il y a des mots entrecroqués, des lèvres Sans visage, se parjurant dans les ténèbres. Il y a l'air prostitué au mensonge, et la Souillure jusqu'au secret de l'âme. Mais il y a Le feu sanglant, la soif rageuse d'être libre Il y a le sang qui commence à peine à couler, Il y a la haine et c'est assez pour espérer, Il y a des millions de sourds, les dents serrées.

ceux dont il avait envie: voilà «La Biche», ou aussi: un vieux savant s'intéresse à une orpheline dont il a aimé la grand'mère, l'enlève de sa pension où elle est malheureuse, et la marie à un élève de l'Ecole des Chartes, et c'est «Le Crime de Sylvestre Bonnard».

Si en général le sujet est peu de chose, les personnages vivent. Il a peint des incoscients, des êtres incapables de se repeller sur eux-mêmes.

La série en est admirable. Voici M. Godet-Laterrasse, le maître penseur, tout plein de vanité. Voici Télémaque, ancien général nègre, devenu marchand de vin et qui a des extases devant la détroque de sa gloire passée. Voici le marquis Tudesco, le proscrit italien; M. Fallaire de Sizac, l'homme d'affaires; M. Haviland, l'Anglais qui collectionne dans des flacons l'eau de tous les fleuves, et combien d'autres. Mais Sylvestre Bonnard est la figure la plus originale que le Père France ait dessinée. C'est l'homme du XIXème siècle, vieux savant célibataire, très intelligent, très réfléchi, très ironique et très doux. Et cette figure est vivante.

Mais il ne faut pas oublier le «Livre de mon Ami». «Ce Livre» disait Jules Lemaitre, «plait» aux mères, car il parle des enfants. Il ravira les poètes, car il est plein de la poésie la plus naturelle et la plus fine à la fois. Il contentera les philosophes, car on y sent à chaque insinuation l'habitude des méditations sérieuses. Ce qu'il y a dans ce chef-d'œuvre, ce sont les impressions d'un enfant très précoce, d'un enfant qui sera passionné des formes, des rêves et des contemplations. Je cite spécialement comme merveille de psychologie infantile, le chapitre ou Pierre, unissant les saints qui se dépouillent des biens de ce monde, jette ses jouets par la fenêtre: «Cet enfant est stupide» s'écria mon père en fermant la fenêtre.

«J'éprouvai de la colère et de la honte à m'entendre juger ainsi. Mais je considérai que mon père, n'étant pas saint comme moi, ne partagerait pas avec moi la gloire des bienheureux, et cette pensée me fut une grande consolation».

Le scepticisme chez notre écrivain est doublé de l'ironie souriante. Cette ironie est douce, calme et s'insinue partout. Continuelle et volontaire, elle est le ton habituel d'un homme qui s'étudie et étudie les autres.

Ironie et tendresse ne supposent pas seulement un esprit étincelant et une fine sensibilité, mais une science étendue, l'habitude de la méditation sur l'homme et sur le monde et la connaissance des philosophes qui essayèrent d'expliquer ces deux inconnus.

Ai-je besoin de parler de son style? Ses ennemis les plus déclarés comme ses admirateurs les plus fanatiques, sont d'accord à dire que son art est inimitable. C'est qu'en effet, nourri des lettres grecques, il a conservé comme son dieu Racine, le culte de l'élegance et de l'exactitude. Joignez à cela la peur de la rhétorique et de l'emphase. Anatole France est le dernier représentant de cette lignée de dilettantes et sceptiques qui part de Montaigne et se continue avec Diderot, Voltaire et Renan.

Strane Kurdi

HEDKA QASO & HESENÉ MUSA

Hey wax, hey wax, mala miné heyfa çavê Hesené Musa ax ketinê.
Heyfa canê torinê mala Musa kurm ketinê, hey wax, hey wax mala minê.

Hedo ban kir, Hesen qurban bira, li me nehata îda wan Hecfyal Ez û torinê mala Musa, me xwe berda binya mala rex gelfya.

Ez û Hesené Musa sekintn li bin dara van mazlya, Me ji xwe ra, dest kir, bi ken û henek û laqirdiya, Hesené Musa destê xwe avêt ristikê moriyê mi qetiya;

Me berev kirin hil û mori, bi tiliya;

Mi di du tiving li Çiyayê Mazî li me teqlya;

Mi di torinê mala Musa li cem mi keff bi dev û ruya;

Wek dara sipî darê wergeriya, Mi hesab kir, mi go belki vana neçirvanê mala me ne, davên seyda pezkûviya;

Mi di Ehmé Qaso bi sê denga, li mi qûriya, ban kir go:

Hedokê delê, mezeke birina Hesen li ku ketiya,

Mi go: mala we bişewite we lëxist li mihrika piştê gurzê, piya birin yek e, xwîn jê davî bi du ciya;

We kuştîye torinê mala Musa, şerê serê çiya,

We ûcaxê mala Musa kor kir, çira mala Musa ji binda wergeriya.

Hey wax, hey wax mala minê: Hesené qurban ro hilatî, ji hel û bela şewqê xwe da Mërdîna şewitî, qesrê pirotî, minarê mella

Mi di qîz û bûkê mala Qaso teqî û sitil girtin, çûne cilla,

Mi go rebî tu zatekî pir mezin e, belki tu şaya topkê bavî, şûna kula mi por kurê:

Hesené Musa birindar e bi çar gulla;

Hey wax, hey wax mala minê; Hesen qurban, mi bengîn sed car bengîn;

Mi di torinê mala Musa serê xwe girêda bi kumê omerî, bi desmala qehwe rengin; Mi di dengê tivingê mala Qaso ketin Çiyayê Mazî, Xaroka rengin;

Hesen qurban, tîlê xelkê gişikî dil bû, dilê min û Hesené Musa li Çiya yê Mazî bû derengîn;

Kuşîna torinê mala Musa li çiyayê mazî li nav neyara bûye dengîn;

Hey wax, hey wax, mala minê. Hesen qurban, Çiyayê Mazî bi dûman e torinê, mala Musa tembûr van e, mi tembûra torinê mala Musa ji gulika xemilandine;

Ez û torinê mala Musa li binya mala, rex gelfya, tim meşiyane; Min û Hesené Musa, me ji xwe ra dest kir bi ken û henek û laqirdiya ne;

He enê Musa destê xwe avêt qorê moriyê mi, giş qetiyanê,

Mi di du tiving li çiyayê mazî, li me teqiyane, torinê mala Musa ketî bû bi dev û ruya ne.

Me hesab kir, mi go belki vana seydvani ne, neçirvan in, ji xwe ra davî seyda pez kûviya ne,

Mi di simikê fêdo Ellyê Ce'fo Ehmé Qaso, bi sê denga bi ser mi da li mi qûriyanê;

Ban kir go Hedokê delê, mezeke, Hesené Musa birindarê çend gullan e;

Mi go mala we bişewite, maşalê nav û dilê we bigerin li daran û li devlya ne; We lëxistî li mihrika piştê gurzê piyan e.

We kuştîne torinê mala Musa, şerê-di çiya ne;

Hey wax, hey wax, mala minê, Hesen qurban, mi go bira

li me nehata îda vê qurbanê, mi di vê sê qîz û bûkê mala Qaso, bejna xwe xemilandin çûn govendê, çûn dîlanê;

Xortê mala Qaso zo bi zo bûn gişa rahişt tivingê modellî, giş herikîn ber nişanê,

Ez pejna torinê mala Musa vê sê nakim ne li cemaetê, ne li meydanê.

Hey wax, hey wax, mala minê; Hesen qurban ji teyran-teyrê bejl mi danî li sanca Qaso;

Ser wî hejl birina xelkê giş birin bû, birina Hesené Musa sitlek davî xwîn û yek tê mejî;

Hesen ban kir: Hedokê dozma-mê, tu bes bigrî bi delalî, bira subhanî xwe ji çavê ta reş û belek ne be xalî, a hatî serê min û Hedoka Qaso bira nê, serê nebî Eyûbê kurmo xwarî;

Hedo ban kir Hesen pîsmamo, tu bes binale, ji ber kezêbê hey mi qatîlê, mi sebebê;

Hey wax, hey wax, mala minê; Hesen qurban, mërğa Buloka çî rengîn e, ez û Hesené Musa me bi destê hev girt, bi eqq û kêfê-ke mezin, wek ziyaretvanî herin Sîne;

Em bîskê li bin dara mazlya sekintn ne, mi di du tivinga li çiyayê mazî bû teqîn e mi di torinê mala Musa ketî bû bi ser mi da, bi çar gulla, bi birin e; mi hesab kir, mi go belki vana neçirvan û seydvani ne, mi di Simê Fêdo û Ellyê Ce'fo û Ehmé Qaso bi sê denga bi ser mi da bû qûrîn e;

Bankir go: Hedokê delê, mezeke tu birina Hesen li ku dibîne,

Mi go: lawo maşalê hûn bin Xwedê, nav û dilê we bi daran û deviya bigerîne, we kuştîne torinê mala Musa, birina Hesené Musa sitlek davî xwîn e.

Hesen ban kir go: Hedokê, dozma-mê, ez diki birim birina mi mezin e, pir dêşne, tasek ava xarokê bi mi gihîne.

Hedo got: Hesen pîsmamo di pê te ra kesek mi na hewîne, ezê du ta ji temerya te biqusnim di bəriya cubbe xînim:

Heçî cara tu bi bîra mi ket, ezê bigirim û maç kim, pê-kerba dilê xwe bi derxînim, mi ne heqya mala Qaso qebûl kirî, rebî tu hilnî ne.

EBDILHADÎ MIHEMED

PÛJINÛN DINYAYÛ

CENG & BIHINGEH



Ne Bitené Mër, Lê Dot û Jin Ji, Di Cengê Azahî û Serbestiya Cihanê De, Karine Heja Pêk Tinin. Moto-sikilsiwareke Emerikantî.



Topeke Mezin, Ji Qiwetên Frensa Şerevanî.



Ji Bergehên Cengê Cihanê, Qesletangeke Hindî a Mezin.

SIDNEY— Li gora telegrafên dawîn yê n ko ji Nû-Bretanyê hatine, silehendazên emerikantî yê n ko ji sê aliyên bi nav erdê Nû-Bretanyê de pêş ve diçûn, qerargeha generalê Japonî Natşûda standîne.